

ROJA NÛ

XWEDÎ Û GERÎNENDE: MÎR Dr. KAMIRAN ALÎ BEDIR-XAN

Kiriyariya Roja Nû; ji bona erdên Sûriye û Libnanê; 10 kreyên Sûri; ji bona welatên din 2 kreyên ingilîzî. Bihayê Hejmarekê: 10 Qemerî.

Diwan û gerîndekariya Rojname: Bêrût-Birc; Waqîf Tabet, Telefona Diwana: 74-04; Telefona Mala Xwediyê Roja Nû: 84-41. Edresa telg: Bêrût-Xojanû.

CENG & SIYASET DEWRAN

CIHANA NÛ

Azahi û Serbestî

Cihana Nû Emerîka ye. Berî çend sed salan, zehf xelk ji zilm û zorkeriya Mezin û Hikûmetan aciz bûbûn û dixwestin ji xwe re erdekî peyda bikin ko tede dikarin aza û serbest bixebitin; û zalim û zorker têkilî wan ne bin. Ji çar aliyên dinyayê peyayên ko azahî û serbestî armanca wan bû, ketine rîya mihaciriyê, hatine erdê Emerîkayê ê kêmxelk û vala û lê li hev civiyane, destê hev û du girtine û dest avêtine avakirina welatê xwe ê nû.

Lê azahî û serbestî ne ev gul e ko mirov bikare destê xwe dirêjî wê bike û wê biçîne; û dîsa azahî û serbestî ne ev tişt e ko ji ber ko xelk jê hez dikin tê pêşîya wan, û gava xelk jê re dibêjin bibe, ew çêdibe.

Azahî û serbestî mîna giya û gulçîçekên spehî ye, va ko hêdî hêdî digehe, bilind dibe û ji bora bi xwedî kirina azahî û serbestiyê mîrîne qenc divêtin yên ko dixebitin, çavsor in, ji mesûliyet û berpirsiyariyê na tirsîn û dizanin: bi tenê mirovên ko tu tişt na kin xelata ji na kin, û yên ko dixebitin xelata ji dikin, û ev ne tu xem e, û çêdî û baweriya mirovên pak û xebatker, mîna ronahiyek e, ko pê rîya mîlet round dibe, û mîlet armanca xwe dibîne. Armanca bilindtir û mezintir azahî û serbestiyê.

o o o

Xelkê Emerîkayê piştî ko dest bi xebatê kirine, hêdî hêdî û hêj bêtir mîna azahî û serbestiyê seh kirine; û seh kirine bi çi awayî divê mirov ji berpirsiyariyê me tirse; û insan çawan dikare mîna mirovekî aza û serbest bîjt.

Xelkê Emerîkayê hin bi hin qedrê azahî û serbestiyê hêj bêtir seh kirine û baweriya xwe pê anîne.

Dirok û tarîxa Emerîkayê pêş me dîke çawan, wan halê xwe edilandine, pêş ve ketine û ji bona azahî û serbestiya xwe şerî dijimîna kirine û di rîya serbestiya welatê xwe de hatine kuştin. Bi vê îman û baweriyê, bi baweriya azahî û serbestiyê di şerên xelasiya Emerîkayê de, wan şerî Ingilîstanê û dîsa ji bona azahî û serbestiyê, hikûmetên bakurî û nîroyî şer û neyartiya hev û du kirine.

Serbestî Çi Ye

Mana serbestiyê çiyê? Ma ev çi tiştê hêja ye ko xelkên Emerîkayê bi tevayî, ji bona serbestiyê gava hewce bû û hewce dibe mal û canê xwe dane û didin

Himên, asasen avahiya emerîkanî en xurt çî ne? Asasa pêşîn ev e: her insan, her peya xwedî qîmet e, xwedîheq e û xwedî qedrê. Her kes, jin û mêr divê qedrê jin û mêrên din bigirin, riayetî heqên hev û du bikin. Nabe ko hin peya rabin û bawer bikin ko ew ji xelkên din bêtir in, bi qedirtir in, dikarin li ser hisabê xwe xelkê bixebitînin û ko zîkê wan xebat kera têr kirin, bawer bikin ko heqê wan hatiye dayin. Yê ko dixebite divê hinde pere bikeve destê wî ko pê hikare di malseke paqî de rûne,

TELEGRAFA GENERAL DE GOL SERSALA ISTIQLALA DEWLETA EMERIKAYÊ

Cezayir—A.F.I. Bi hênceta sersala istiqalata Emerîkayê General De Gol telgrafa jêrin şiyandiye mîletê emerîkanî: Bi hênceta sersala istiqalata emerîkanî silavan li mîletê emerîkanî dikim. Emerîkanî îsal eydaniya sersala xwe a istiqalê di dema şerî de dikin. Ev ji bona azahî û serbestiya xwe û ya cihanê şerî dikin; ji ber ko azahî û serbestî naye lêkve kirin. Frensa teniştê Emerîkayê de ye; ji bona azahî û serbestiya dinyayê, ji bona pêkanîna cihaneke nû û serbest.

CENGÊN HEWAYÎ

Hevalbend Li Her Derê Êrişî Mihwerê Dikin

Di Eniya Behra Spî de, refên britanî û emerîkanî bi şev û bi rojê hevalbend bajar û şarîstanên talyanî didin ber bomban. Hefta borî çêkê hevalbend ê hewayî li balafrgehên erdê Yewnanîstanê ji xistine û dirêjî waporen Mihwerê kirine. Refên britanî û emerîkanî ji aliyê din bombardîmanên erdê Germanîstanê û erdên vegirtî angoyaxa Frense, Belçîke, Holende û Norveccîstanê pêş ve dajon. Hefta borî Hamburg, Koln, Boxum, Wupertal, Elberfeld bi awakê gelek dijwar hatine bombardîman kirin. Di ser eniya Sovyetîstanê re jî şerîne hewayî en xurt dom dikin. Leşkerên emerîkanî û Ingilîzî pê li erdên giravên Pasîfîkê kirine.

HEFTÊ Û ÇAR HEZAR BALAFIRÊN NÛ TÊNE ÇEKIRIN

Weşington—R: Karxaneyên emerîkanî ji nû ve 74.000 balafira çêdikin; 36.000 bombeavêj û 38.000 nêçîrwan.

Moskû—Refa Frensîzi Normandî di eniya şerê rûsî de, der pêşîya elemana ji nû ve serfiraz bûye, balafrvanên vê refê, şevkê de 5 mekîneyên elemanî avêtine erdê.

QALA HEMI ENIYAN

Li Her Eniyê Hevalbend Zora Mihwerê Dibin

Radyo Moskovayê bûyerên hefta borî tîne pêş çavê xwe û dibêje: Di erdê elemana de taxê, bajar, bender, şarîstan destgeh û febrîçan bi derbên bombeyan Hevalbenda bûne kavi û xirbe.

Elemana zaroa xistine şûna mirovên ko çûne eniya rohelatî. Bala firên elemanî edî nikarin ezmanê erdê xwe, ji ta'da hevalbenda bi parêzin û ezmanê Germanîstanê de refên hevalbenda bi serbestî digerin.

Di Ellenfîkê de zora noqavên elemanî hatiye birin, û edî qeslwaporen hevalbenda di bhehên dinyayê de bi selamettî gest û guzar dikin. Behra Spî—Stola talyanî nihû nikare ji bendera derkeve û bikeve Behra Spî, ji ber ko Behra Spî, di destê Hevalbenda de ye. Di Hindurî italyayê de xelk ji vî şerî, ji şerê Musolînî û peyayên di wî aciz in û aciziya xwe vekirî dibêjin; heta niha bi vî tometê 11.000 talyan hatine girtin û avêtin zêdana.

Cezayir—R: Qerargeha Hevalbenda a mezin li Efrîqa Bakurî elam dide: bombeavêjên me Wellington êrişî Mesînyayê kiriyê; Refên me en din karê xwe ê didevanî û nobetdariyê pêk anîne; ji wan êrişana du mekîne venegeriyane warên xwe. Duhî topên me en balafrîşiken, di ser Pantelariyayê re, 4 mekîneyên dijmin anîne xwar.

cilên paqîj li xwe bike, zaroyên xwe bigîne dibistanê û ji bona rojen tengî an nesaxiyê jî, çend peran bimîne destê wî de.

Her kes dikare li gora daxwaza xwe bigire û berde, bi îşên ko dixwaze mijûl bibe, rabe û rûne, şerî ev e ko ta'da heqên xelkê ne ke. Ev tiştên he heqê hemî insana ne, biçûk an mezin, belengaz an dewlemend, xwedîgund an cotkar, axa an peyayekî adetî, şivan an mir, û di vî babetê de, di mesela heq û qedirgirtina heqên insanî de, der nav bira wan tu ferq nîne.

Wezîfeyên insana hemberî hev û du de, mîna hev in. Mirovek nabe ko destê xwe dirêjî keve û heqên mirovekî din bike. Divê her kes barê wezîfeyên xwe hilgire, û di nav xelkê de, ji bona azahî û serbestiya hemshehiyên xwe, welatiyên xwe, wezîfên xwe pêk bîne.

Divê her kes bizane ko heke peyayek bê sebeb, bê heq û qanûn hatiye eşandin, siha wê zîlmê ezmanê welêt tarî dike, û heke ev destê zalim ne hatiye jêkirin, siha, ew radibe û tada mal, can, namûs û heqên mirovên din jî dike.

Mîlet û Karên Mîlet

Xelkên welatekî, divê, îş û karên welatê xwe bi destê xwe bigirin. Mîletî divê ji bona gerandina îşên welêt, ji xwe re serekê û civatek bibijêre û heqên vî sermî-


yanî û vî civatê çîne, pêş wan bike, û heke rojekê ji wan ne razî ye, divê bikare wan rake û li şûna wan peyayên din bixe.

Emerîka bi vî awayî tete idare kirin, ji vî îşlê re «Demokrasi» tete gotin. Frense, Britanya-Mezin ji bi vî îşlê emel dikin. Sermiyan û serekên mîletekî divê kar û xûşlên vî mîletî li gora daxwaza mîlet bigerîne, û bala xwe bide heke xelkên welêt ji can, mal, azahî û serbestiya xwe ewle ne an ne, heke halê wan baş e an ne, heke halê wan çêtir dibe an ne, sibetên xelkê çawa ye, gelo xelk bi xwe hînfî xwendin û nivsandina zimane xwe dibin an ne, heke zaroyên xwe diştin medrese û dibistanan an ne, heke yê ko dixabîtin heqê xwe bi timamî distînin an ne, heke xurt zorê didine qels û belengaza an ne. Serek û sermiyanên ko bala xwe na din wan tîta û ji bona bextiyarî û kamiraniya xelkê xwe na xebitin, ji cihê xwe ê bilind tene anin xwar û carna ji tene existin zêdan û girtigehan.

Sonda Mîletê Emerîkanî

Mîletê Emerîkayê ketiye vî şerî û sond xwariye ko piştî serfiraziya Hevalbenda, hemî mîletên dinyayê dibin aza û serbest, û ew li kîjan erdê, li kîjan hêla dinyayê de dibin jî, azahî û serbestî heqê wan e, û ev qencî û rehmetê bê şik û bîshe wê bigehe wan,

DI EFRÎQA BAKURÎ DE



Tevdanine eskerî en nêzin. Hevalbenda bi vî awayî erdê Efrîqayê ji leşkerên Mihwerê bi timamî paqîj kirin e.

Eskerek



Reşîk şerevaniyine bi zirav û eskerine sernerm in.

SERPÊHATÎ

Çîreka Rovî û Jîjo

Carekî rovî û jîjo di cihekî daristan de, bi hevaltî ji bo nêçîre digeriyan, ji nişkekê ve dawek beranan li erdê dîtin, jîjo ji rovî re got:

— Fermo bi xwe; rovî got: ez bi rojî me, tu bixwe, jofî dev avêtê dawê û dam (xefik) lê teqîya û lingê wî girt. Gava rovî dit goştê bêtiirs Jîjo (şojî) gote rovî: Mane te digot ez bi rojî me.

— Got: belê ez bi rojî bûm, lê roja şîkê ye, girtin heram e, jîjo got:

— Her tu xwe diparêzî û hevalê xwe di kortalên bê eman wer dikî. Qenebu tu were nik min, tenbiya mal û çêlîvên xwe li te bikim. Rovî got: bêje; jîjo gct: nabe, nêçîrwan bi me bihesin, were devê xwe têxim guhê te û bêjim. Gava rovî guhê xwe da ber devê jîjo, gezek li guhê wî da û xwe gîzandê nav qalikê xwe bi şîrî; rovî lava kir ne kir berneda û goti-yê: — madam te ez xistime vi hallî, ez jî te bera na din heya sibehê; xwediyê xefikê bê, wê te bîkuye û min berde, wê bç'e ev rovî besî min e. Bû sibe, xwedî hat û rovî girt û kuşt û jîjo ber da; ê rast kutah (xelaw) bû ê hîlebaz gîha heqê xwe.

BRAHIME SEYDA

DEMA NIHA

GENERAL SIKORSKI

Serekwezir û Serdarê Ordîyên Polonî Hatiye Kuştin
Londre—R: Balafira ko serekwezirê Polonî General Sikorski diani Londre, di nêzikî Cebeltariqê de ketiye erdê û General Sikorski hatiye kuştin.

Rome— Radyoa Romayê duhî digot: hawîrên selahiyetdar bawer dikin ko Ordîya Sor haziriya xwe kiriye û êrişa sovyetî ber bi destpêkirinê ye.

Weşington— R: Leşkerên Hevalbenda di erdên Nû-Gineyê û yên giravên Silêmana de pês ve dikevin.

Cezayir— A.F.I. General Katrû roja şembê hatiye Bêrûtê: ew ê heftekê di Suriye û Libnanê de bimîne.

Londre— A.F.I. Elemana ji nû ve di Norvecistanê de zehf mirovên heja û yekan girtine a avêtine zêndananan.

Londre—R: Şevdî refên britani ji nû ve bi ser Germanistanê de girtine, lê kitkitên ve êrişê hêj ne hatine belav kirin.

Londre—R: Zehf refên Kenadî û Nû-Zelandî hatine Ingilistanê û tede qerargeh girtine.

Nû York—R: Li gora Nûçeya ko ji Cezayirê hatiye Asosiyetêd Pres, General Jiro ji Cezayirê rabûye û berê xwe daye Emerikayê.

Londre—A.F.I. Nivîsevanê Britanovayê ê eskerî dibêje, Ertîstên emerkani yên Pasîfîka Nîro-roavayî destpêka şerîne hêj mezintir in; ji wextê ko japona ji Guadelkenalê hatine avêtin, hevalbenda qiwetina mezin anîne Pasîfîkê.

Mîrê Mezin û Mezinê Mêran, Xortê Xurt Zanagê Kurd

Dr. KAMIRAN ALI BEDIR-XAN

Hevalo! Di van rojan de Roja-Nû, weke rojeke geş, tav û tîrêjen we dane dîwarê me ji yê xortan. Çirûsk û ronahiya wê, leylana paşketin û behêviyê, ji ser dilên ciwanên Kurdan hildane. Kela jiyîna-welêt ji gela mirinê gihande delawê serbestiyê.

Bûka xweşxwan û nivîsaran xemiland bi qumaşê evîn û zanistiyê. Pira nejadperestî bi topên baweriyê daweziran û di tangê dilxweşiyê de afrand. Ji wî rîya wa dîr bi hezaran kilômêtir şose kir û derê bajarê armanca me, li me vekir. Xwedê te û Roja te birukî spî û jîneke dirêj ji kurdan re bihêle. Ji ber xortan ve roja te pîroz be.

CEGERXWÎN

P i r o z n a m e

Roja-Nû, tu gelekî bi xêr hatî. Ji mîletê Kurd re pêpar (siûd) bî. Jina me a tevayî, ji tîrêjen te ên zer û tûj teva dibe. Lêbelê berî tu derkevî, nejadê kurd gelek çevreşên dilbirin û dijwar bihartin. Kusûfa te beriya sariya spêde dest pê kiri bû. Ji lewre tu dereng hilatî. Gaziya Hawarê. Ev hilavêtina te bi awakî adetî pêk hat. Lewre «Ronahiyê» di pêşiya te stûneke gewr peyda kir. Vê ronahiyê ji rohelat hengura şevê paqij kir, ber bi roava ajot gihande jebere ferat tixûbê yar û neyaran. Heja tîrêjen te birûstî û baskê xwe avêtin lat û zinarên çiyayên Kurdistanê. Bi vî ronahiyê her karên gelêr û tîvel tete kirin. Her newal û şkeftên tarî ji neçevanan re bû haziriya armancan. Li gora ko çavê merov li her rojê nayête vekirin. Lê bengê ez li te dinêrim bêt ko çavê min hêstir dîke. Nemaze nabênijim ji.

Çima? Hevqas bi min xweş te. Ji ber ko heçî nexweşî û mîqerobin (aneffil) hene bi wan tîrêjan tene suhtin; û wek pertavê, wan dibirêje. Van janên gyanbir wînda dîke û vê brûskê ronîya jankuj zende dibe. Belê her derketiyên nuh kevinbûnek wî heye. Lê kevinên bînge hî her û her nûreng in. Herwekî «Nuroj» berî çend sed salan dîsa wekî niho ji welatê me heya erdê Awropayê çû û li cihanê pêde belav bûye. Ma ne ev cejna me ye ko hemî nejadan ev ji wek cejnên xwe ên welatî diparêzin û bûye destpêka sale.

Ma di zimanê me de «Roja-Nû» û «Nû-Roj» çî ferq heye.

Spas ji «Roja-Nû» re. Xwe ne hêvişand û bi awakî zanistî tejj, kirasekî nû li xwe kir û bi dengêkî nû kete guhên welatîyan.

Ev dengê te xewaran şiyar dîke. Kirasê te bi tîp û klîşe û deqîne welê ne ko hêj tu destxetî çenekiriye û tu kesî li bejina xwe ne kiriye. Ma ev kirasê giranbêha ne ji bo bûkîtiya Zîne ye. Ev kembera sor û kesk û di nava wî de rojeke zer ne ji bo dest avêtina Memf ye. Her bijî pêkaniyê daweta mezin. Em hemî xwendiyên te ne.

H. HIŞYAR

Pergala Roja-Nû

Li gora awayê rojnemeyên siyasî divê ko xwendevan ji Roja-Nû re her bûyerên welatî bigînin. Ji xwe stûnên Roja-Nû, ne ji bo tîştên çirokî, lê nemaze ji bo rewîşa dinyayê pêk hatine. Ji çirok, dîrok û gi-hîr re pelên Hawar û Ronahiyê vekirî ne. Roja-Nû bi tenê ji bo newçeyên derve û hundirî û hin nesrên ko gerîndeyê berpirsiyar biecibîne ye.

Ji lewre divêt ya me jî, wekî xelkê rojnemeke tekûz û békêmasî be. Di doza welatîniyê de ev rojname ji me re rewş û pergaleke navdar e. Ji ber vê yekê tîştên ko jê re bêne şandin divê heja û li ba her îyaniyên pîspor bêne ecibandin. An ne nivîsaran nehêja divêt bêne tenqîd kirin.

H. HIŞYAR

Dibistana Kurdî a Bêrûtê

Ev e navê Mirza û Mirzeyên ko tîne, Şêx Mûs Mehmûd Qesrikê, di Dibistana Bêrûtê a Kurdî de hînfî Hisnî Merzikê, Mihemed Selîm Tuhê, xwendin û nivîsandina zimanê xwe bûne: Ma. Seade Elî Botî, MM. Sileyman Hesên Mercê, Xelîl Silêman Dêrikê, Çaçan Merzikê, Brahmî Ma-

Kindêrê, Ebdîlkerîm Etmên, Mihe-med Nûr Mihelmê, Tahir Millêzinê, Mîrxan Racnî, Hecî Nûr Botî.

MIREKA CIHANE

MIRÊKA CIHANÊ MIRÊKA WÊNEYÊN ŞER Û AŞÎTIYÊ

WÊNEYÊN ENIYA ROHELÊT




TANGEKE SOVYETÎ A MEZIN. DINYA ZIVISTAN E, Eskerên rûsî kurkine spî li xwe kirine, wilo çavê dijînin zu bizû li wan na keve.



Ava Robara boş bûne, erebeyên elemanî ên eskerî li avekê derbaz dibin; îşê wan zehmet e.



Karxaneyên rûsî her meh bi hezaran tang çêdikir. Ev tanên ke nemaze ji bona çêrên zivistanê gelek bikêrhatî ne.



BALAFIREKE SIVIK Û BI LEZ Ev mekînoyên he karê nobetdarî û dîdevaniyê pêk tînin.

LE JOUR NOUVEAU

Direction: Beyrouth Wakfs Tabet
Place des Canons Tél. 74-04 et 84-41

QUOTIDIEN KURDE
Directeur - Propriétaire: EMIR DR. KAMURAN AALI BEDIR KHAN

Le Numéro 10 P.L.S. - Abonnement
Syrie-Liban 10 L.L.S. Etranger 2 L. Stgs.

Vers la Victoire

CHRONIQUE HEBDOMADAIRE
DE LA GUERRE

Sur le fond toujours aussi continu de l'offensive aérienne contre l'Europe se détachent cette semaine deux événements: l'un, d'une grande portée psychologique, le discours de M. CHURCHILL, l'autre plus réaliste et venant faire la preuve de ce discours, l'assaut américain dans le Sud-Ouest du Pacifique.

M. CHURCHILL a parlé une fois de plus. Et de son discours, se dégage une fois de plus une impression de confiance, de mesure, de simplicité. Il nous dit sans emphase les raisons de la victoire prochaine des armées de la liberté sur le fascisme. Avec une volonté et une énergie surhumaines il a résisté, seul, en 1940 aux attaques d'une Allemagne dont la puissance montait chaque jour. Aujourd'hui par la volonté et la puissance d'un Empire Britannique, d'une Amérique et d'une Russie associés dans un même but, avec des moyens dont la masse augmente chaque jour, l'Allemagne reste sur la défensive et craint l'invasion. La comparaison est réconfortante: l'espoir a changé de camp. Le minuscule GOEBBELS, spécialisé maintenant dans les discours de pure propagande, a fort à faire pour répondre, avec sa rhétorique, à la parole du Premier Anglais aussi nette et aussi froide dans sa vision de l'avenir qu'un couperet de guillotine.

Dans le Pacifique, quelques jours avant l'anniversaire de l'Indépendance Day, les Américains ont déclenché une assez large offensive contre les bases Japonaises. Cette offensive qui se développe favorablement aurait pour but final la prise de Rabaul, port d'une importance capitale de la Nouvelle Bretagne.

Sa prise signifierait la dislocation des voies de communication et de ravitaillement ennemies dans ce secteur du Pacifique. On prévoit que les Japonais la défendront coûte que coûte et leurs unités navales sont attendues avec impatience...; le souvenir des défaites magistrales de la mer du Corail, et de Midway est encore frais dans nos mémoires! Déjà 166 avions ont été abattus par l'aviation et la D. C. A. du Général MAC ARTHUR en deux jours de combat. On se rappelle qu'il y a environ 3 semaines 77 avions Japonais avaient été détruits dans le secteur des Iles Salomon lors d'une attaque massive sur les concentrations Américaines.

Où en sont les opérations? Le port de Viru a été occupé dans l'Extrême S.E. de la Nouvelle Géorgie. Dans les Salomons l'île de Randowa a été également occupée

LES DEPECHEES de la NUIT

Front Occidental et Atlantique:—Bombardement de Cologne, Hamburg, Le Mans, Nantes, la Pallice par l'aviation alliée.

Méditerranée:—Olbia, Trapani et les bases aériennes ennemies autour de Tarente sont pilonnées par les bombardiers Russes:—L'aviation soviétique bombarde Kertch et Temryuk. Les Allemands perdent un millier d'hommes au cours d'une vaine contre-attaque dans le secteur de Kalinine.

Pacifique:—L'offensive américaine se développe avec succès. 21 avions japonais abattus au-dessus de Rendova.

Washington—Q: Le Vice-Amiral John

Hoover, a quitté La Martinique après avoir conféré avec l'Amiral Robert.

Selon radio-La Martinique, l'Amiral Robert aurait proposé de rallier Giraud et de Gaulle. Mais en retour, aurait demandé la garantie des Etats-Unis du maintien de la souveraineté française, la non intervention par les forces armées étrangères, et la reprise du ravitaillement en vivres.

Melbourne—R: Le communiqué du Q.G. Allié annonce que les Américains continuent à avancer en Nouvelle-Géorgie. Au-dessus de l'île de Rendova, 21 avions japonais ont été abattus.

LA LITTÉRATURE FRANÇAISE

RONSARD (1525-1585)

Comme presque tous ses disciples et imitateurs, comme J. du Bellay et A. de Baif, Ronsard est gentilhomme, trait qui a son importance, car l'indépendance, la dignité, la hardiesse et l'influence du poète dériveront de sa situation sociale. La famille de Ronsard, originaire de Hongrie, serait venue s'établir en France au quatorzième siècle.

Pierre de Ronsard naquit le 11 Septembre 1525, au château de la Poissonnière, près de Vendôme, dans une charmante vallée arrosée par la Loire. Après des études trop rapides, le jeune Ronsard suit son père à Avignon, au camp de François Ier, puis passe au service de Jacques V d'Écosse qu'il suit dans son pays. Il revient en France en 1540, fait partie de plusieurs ambassades en Allemagne et en Italie et devient un jeune gentilhomme activement mêlé à la vie diplomatique et à celle de la cour.

Ceci n'était que la première période d'une existence bientôt consacrée à la retraite et à l'étude; les impressions de nature, de voyage, de cour, forment chez Ronsard un fonds essentiel et il en rejouira sans cesse des poussées imprévisibles.

Profitant de ses loisirs pour aller étudier chez son ami Antoine de Baif, on peut juger de l'activité intellectuelle du milieu fréquenté par Ronsard qui, sachant déjà l'anglais, l'allemand et l'italien, se mit avec ardeur à l'étude du latin et du grec. Pendant sept ans, Ronsard commenta et traduisit les auteurs latins et grecs, et en 1549 se constitue la «Brigade» composée de Ronsard et de ses amis du Bellay, Baif, Jodelle, Rémi Belléau, Ponthus de Thyard et Daurat, «Brigades» qui bientôt s'intitulaient la «Pleiade».

D'un esprit fier et susceptible, Ronsard fut néanmoins, entre 1550 et 1574 un véritable poète de cour. S'il a pendant cette période, des accès d'éloquence patriotique, s'il parle haut à son Roi et au peuple de France, il consent toutefois à écrire pour Charles XI des poésies de circonstance. Sous Henri III il fréquente moins la cour. Il souffre de la goutte, il est devenu morosité. Il habite alors le plus souvent à Croix-Val près de la forêt de Gastine. Il aimait beaucoup la campagne.

à 8kilomètres de Munda qui est déjà bombardée par des batteries terrestres installées à Randowa. Un débarquement dans la baie de Vassau, en Nouvelle Guinée, menace Salamoa qui est à 35 Kilomètres de là.

Cependant que la marine Américaine bombarde des îles du groupe des Shortland et que l'aviation pilonne les aérodromes d'où pourraient venir les secours.

En somme, tout va bien de ce côté. Verrons-nous bientôt des opérations analogues du côté de l'Europe?

D,

POÈME KURDE

QUAND TU RIS

Si j'étais le jardin d'été
Où tu promènes ta nostalgie
Où tu trouves
Une fleur charmante
Qui te rende ta gaieté.
Une fleur douce,
Une fleur d'esprit,
Qui te pique, qui te caresse
Et par sa douce volupté
Te réveille da ta paresse.
Où je voudrais être
Cette fleur bizarre
Qu'on effeuille entre les dents
Comme le coeur d'un amant
Dans une extase douce et rare.
Au lieu d'être flétri
Par le vent et l'orage
Entre les mains de l'âge
Je veux mourir quand tu ris.

LA ROUILLE

Comme la force des voyageurs
Sur de longues routes
Comme un grand morceau de glace
Qui meurt
Par petites gouttes,
Amour, haine, croyance et doute
Rongent mes artères;
Comme la rouille le fer.
Quelle inconnue me fait ce mal?
Est-ce la langue d'un serpent?
Est-ce le temps?
Sur mon visage,
Entre mes rides fanées
Reposent
Mes soixante années.
Je cherche dans mon coeur;
Plus de rire.
La porte des rêves suprêmes fermée;
Sur mes lèvres
Les débris d'un pauvre sourire.
Mon corps tremble.
Dans l'oeuil de mon coeur
Des flammes
Plus jeunes
Que le plus jeune désir d'une femme
Dans mes jambes
Plus de force:
Et je suis hanté
Par la marche longue de l'éternité,
Devant mes yeux
La table défaite et vide
D'un festin fini
Est-ce pour notre jeunesse
Que l'on nous punit.

DR. BEDIR KHAN

LA FUITE DE LA JEUNESSE (1550)

Quand je suis vingt ou trente mois
Sans retourner en Vendômois,
Plein de pensées vagabondes,
Plein d'un remors et d'un souci,
Aux rochers je me plains ainsi,
Aux bois, aux autres et aux ondes.

«Rochers, bien que soyez âgés
De trois mille ans, vous ne changez
Jamais ni d'état ni de forme.

Mais toujours ma jeunesse fuit,
Et la vieillesse qui me suit

De jeune en vieillard me transforme.

«Bois, bien que perdiez tous les ans
En hyver vos cheveux mouvants,
L'an d'après qui se renouvelle

Renouvelle aussi votre chef:

Mais le mien ne peut de rechef
Revoir sa perruque nouvelle.

«Autres, je me suis vu chez vous
Avoir jadis vers les genoux,
Le corps habile et la main bonne:

Mais d'ores j'ai le corps plus dur,
Et les genoux, que le mur

Qui froidement vous enveloppe.

«Ondes, sans fin vous promenez,
Et vous menez et ramenez

Vos flots d'un cours qui ne séjourne:
Et moy, sans faire de long séjourne,

Je m'en vais de nuit et de jour
Au lieu d'où plus on ne retourne...»

LA PRESSE KURDE

Nous signalons, à nos lecteurs s'intéressant au mouvement culturel KURDE, les journaux et périodiques kurdes suivants:

RIYA TAZE: organe des Kurdes de l'U.R.S.S. paraissant à Erivan.

GALAWÉJ: la plus grande revue littéraire kurde, paraît chaque mois à Bagdad, avec 80 à 100 pages de texte hebdomadaire politique et littéraire paraissant à Souleimanieh.

JITAN revue littéraire bi-mensuelle paraissant à Dimas. Textes kurdes et français.

RONALI Revue mensuelle illustrée, paraissant à Damas.

Provisoirement, LE JOUR NOUVEAU paraîtra une fois par semaine, le Lundi.

INTRIN

DI WELATÉ ZEMBEQÊ GEWIR DE

Nivîsavan
Grigori Petrof

Wergêrandok:
Qedri Can

7

«Ji gundiyan re, ji palan re, ji tebeqa nîzm re awayê jîynê nîşan bikin... da ku millet, qiwet û parastina jîynê qenc fam bike. Di welatê meyî hejî de, ji her gundî û paleyî re jîyîneke hejî hêsantîr, hejî sihtîr, hejî maqul tir bidin zanîn... Millet, hînfî xebatê bikin; bi wan, wargehê erzan û mutewazî bidin çekirin... Ji bona parastina sibeta wan, û zarokê wan, şîretan li wan bikin... Ji wan re behsa maleke bextiyar bikin.. da ku jin û mîr û zaro, çawan li hemberê hev bi xweşî dijîn; mezinkî rîna zarokan bi çî awayî dibê, bizanîn. Ji millet re bidin zanîn ku; her kar divê di zemanê xwe de çê bibe... nîzani û fîtfîz, di her tiştî de lazîm e. Wan, hînfî îtaeta huquqê kesan bikin... û di van tiştan de, hûn bi xwe, ji millet re bibînin nimûne.. Di nav wan de, di nav qewmê xwe de bibînin murebî.

Welatê Suomî mala xwe, mîletê Suomî jî kuffetê mala xwe bizanîn. Bîra bê bîra we ku, ezîngvan, rênçber, û jinbîyên welêt: welatîyê we ne... pîsmam û birayên we ne... Terbîyekirin, pêşvebirin û bîlîndkirina wan, li ser we, wezîfe ye. Ji bîr me kin ku, nezanîn, bê marîfet serxweşî, nexweşî û sêfîliya millet, ji wêre şerm e, ji wêre kêmanî ye...»

Evan penc, şeş mamoste, mamûr û tuxtorên fînfî, ji mineweranan re tim wîsan digotin û bi wî awayî dinivîsandin... Di nav wan de ê dilgewart tir û bi agirtir (Senelman) bû. Zîvîstanê bi çarux, havîne carna bi kelek, carna jî xwas, ser û berê welêt di gerîya û xelkî îrşad dikir. Li çîyan û newalan, li kuderê merîvek bidîta, bi wî re, dûr û dirêj dipeyivî, kitêb belav dikir, edresa wan distend; reşbelek

dişandin û reşbelek di stendin... Senelman, tu ciyê tarî bê ronayî ne dihişt. Tim wîsan di got: Ji bona avdana welêt... du, sê co ne bes in... Kijan quncîka dûr be, ji wê re, ava gol û kaniyan gerek e. Tîbûna manewîyeta millet ji wîsan e. Divê li her derê kaniyên bi can hebin ku millet ti ne mîne.

Senelman, merîvên bi heş li ku bîdiya, ew hişyar dikirin, heşê wan vedikir, bi wan re muxabere dikir... Reşbelekên ku dihate şandin, li ciyekî diçû ciyekî... bi wî awayî, ji gelek kesan re dihatin. xwendin... Senelman di reşbelekên Xwe de, hînek tekdr, hînek jî teqê dr dikirin... Ji wan re wezîfeyên nuh nîşan dikir. Senelman, ku bi çîwa ciyekî, nasê xwe li dora xwe dicivand û bi wan re subbet dikir!

ÇAPA KURDI

KOVAR Û ROJNAMEYÊN KURDÎ

Kovar û rojnameyên kurdî yê ko îro belav dibin ev in:

Reya-Teze : Li heftê sê caran û li bajarê Rewanê belav dibê; rojnameya kurdên Sovyetîstanê ye. Bi zar û bi tîpên kurdmançî tete nivîsandin.

Jîyan: Kovareke edebî û îlmî ye; li serê her heftê carekê û li Sîleymanîyê bi der têt. Bi zarê soranî tete nivîsandin.

Gelawêj: Kovareke edebî û îlmî ye. Li serê her mehê carekê li Bexdayê derdikeve. Zarê wê soranî ye. Kovara Kurdî a mezintî û tekûzîr e.

Hawar: Kovareke edebî ye. Ji sala 1933-an ve li Şamê û bi zarê kurdmançî tete belav kirin.

Ronahî: Ev du sal in, li Şanê dest bi derketinê kiriye. Zarê wê kurdmançî ye. Ronahî kovareke misewer e û li serê mehê carekê derdikeve.

DÛRIK

DÛRIKÊN LI BER TEMBÛRÊ

Kezîzerê

Kezîzerê kezîzer
Li serî destmalek zer
Qamek qut î girover.
Tu j' govendê derkev dor
Ez t' ramisim dîsa her
Xeyr û guneh j' bavê ter'.

Kezîzerê kezîzer
Mîna berfa l' zînara
Sîha dara tim li ser
Kezîzer im sîsê ne
Em her sê delalê dê ne
Em her sê l' ber Zewacê ne
Behra xortê xelkê ne.

Kezîzerê kezîzer
Li meha danê êvara
Sî dagerîyan zînara
Ma dê gewrê xeyirî
Hemî jî kem û xiyala
Hemî jî kul û mîtala.

Kezîzerê kezîzer
Ez xulamê memkên girover
Wê enya te bi nîv ziyer.

Kezîzer im dido ne
Em her du wek heyiv û ro ne
Kezîzerê kezîzer
Mîna berfa li zînara
Si ya dîra tim li ser.

Kezîzerê kezîzer
Kezîzerê mala min
Agir berda dilê min
Xweş e j' gostê laşê min.

Kezîzerê lewendê
Eqlê jî serê min stendê
Sing doşek haliv zendê
Destê xwe li destê min xe
Emê herin govendê.

Kezîzerê dido ne
Rîhan in endikê ne
Kezîzerê em çar in
Her çar in lê li mal in.

Kezîzerê em şeş in
Û her şeş pev re dimeşin
Xweş in jî, çavê reş in.

REMZO

Rêka Midyatê teng e
Paçê Remzo heftreng e
Ranîsanek bide min
Evar e l' min dereng e

Qamişlokê b' bacan e
Heçî Remzo nas nake
Tolê qîza qumandar e

Qamişlokê b' bacan e
Qirka Remzo b' mircan e
Heçî Remzo nas nake
Remzo dosta serjan e

Dêra Zorê mezin e
Par qîz bû fîsal jin e
Heçî Remzo nas nake
Tolê qîza hakim e

Dêra Zorê biçûk e
Par qîz bû fîsal bûk e
Dêra Zorê paytext e
Ka Kevoka l' ser text e
Fincana qebwê li dest e.

PÊJINÊN DINYAYÊ

ŞAHÎNETEKE ESKERÎ A MEZIN Û BI HEYBET



Top û balafir, tang û qumbereavêj, eskerên Hevalbenda tekîlî vê şahînetê bûne.



RÊÇEZANÊN BRITANÎ DI NAV DAR Û DARISTANAN DE

Îşê her mîletî ê mezintir gîhaştina xorta ye. Xortê hevî, qiwet, pêşî û cavdaniya mîletî ne. Xelkê ewripayê, û xelkên mîletên dinyayê ên çav-vekirî heke hewce bû, xwarîna xwe kêmanî dikin û zaroyên xwe dişînin dibîstanan. Roja ko kurda ji bi tevayî, bi veyê qeydê emel kirin, mîletê me dê bibe mîletekî xurt û candar.

Rêçezanî ji bona gehîştina xorta awayekî heja û dibîstaneke qîmetdar e.



KEVIRTIRAŞEKE HÊJA, MAMOTEYERÎ XWEDÎ SEBÎR Û ZÊREK

Eleman herf du salan Londre bi xurtî da bûn l' er bomban û jê gelek avahiyên çedîm û çeleng hilweşîya bûn. Hosteyên îngîlîz ji kevîrên wan avahîyan, heykel û hûr û mûrên heja çedîkin.

Ev hûr û mûr, ji bona çelîyan millet ders û îbret in.